



**Danezanek ji bo misilmanan:**

**Sazûmana eyaleta Baverya derbarê qurbaniyêن Cejna Qurbana İslamî**

- Qurbanî û serjêkirin li nav malê û li derve qedexe ye.
- Anîn û birina qurbanî û dewaran tenê di wesayitên qanûnî (bo nimûne rimorq) tê qebûlkirin. Di bagajê erebeyan de anîn û birîna heywanan qedexe ye.
- Qedrê heywanan bigrin. Hiriye wan nekişînin, li ser pişta heywanan rûnenên, dest û piyên wan girênedin, û HWD. Ne tenê ku heywan êş dikişîne, her wisa kuwaliteya goşt bi ví awayî kêm dibe.
- Li gor qanûna parastina heywanan serjêkirina heywana tenê bi **tevizandin, ango benckirin** tê qebûlkirin. Rijandina xwina dewaran bêyî ku berê were tevizandin qedexe ye. Di rewşen taybet de, meqamê bajêr (dayire) dikare mijarêne awarte erê bike, ango bipejirîne.
- Rijandina xwîna heywanan tenê bi belgeyên zanistiyê tê pejirandin. Agahdariyên zêde hûn dikarin jî dayireya veterinerê bistînin.
- Wekî din, hûn dikarin bi heywana qurbanî ra bimeşin û destê xwe li ser heywan deynin û îbadete bikin, dema ku pispor û naser serê heywana qurbanî jêdikin.
- **Pêwistî: Dema serjêkirinê** kêrlêxistina nehewce û zêde nekin, qirikê bêtir nekişînin û stuyê heywanê neşikênin. Serê heywanan tenê piştî mirinê bi temamî jê bikin.
- Hûn tenê bi destûra quesab dikarin bikevin hindurê quesabxanê. Divê ku cilêن taybet ên paqij li ber we bin (bo nimûne cilêن yekcarî), divê hun **destêن xwe bişûn û pişt re dest û şekalêن xwe bi desinfeksiyonê** paqij bikin. Eger ku hun bikaribin goşt hûr bikin, divê we **telqîna, ango ders û qanûna parastina enfeksyonê** wergirtibe.
- **Lêkolîna resmî ya heywan û goştê heywanan pêwîst e.** Pijişk, ango doxtorê resmî yê heywanan tendurustiya heywanê kontrol dike û çavdêriyê li ser dike, ku gelo çi perçê û hinavên heywanê dikarin werin avêtin an na. Eger ku doxtor ïzna xwarina goşt bide, divê ku mor li ser goşt were lêxistin. Beyî mora doxtor hûn nikarin goşt bi xwe re bibin.
- Hin perçê û hinavên taybet ên bi rîsk nayêن dayin, bo nimûne fatareşik an jî perçeyê dawî ye rûvî (bi latîni ileum) yê pez û ye bizinê. Qesab divê wan perçeyan hilîne û bi awayekî taybet bavêje. Eger ku temenê dewar, pez an jî bizinê zêdetir ji 12 mehî be, kilox, mëjî an jî çaven wan heywanan nayêن standin.
- Divê mîde û rûvî jî aliyê quesêb ve bêن valakirin. Serî û kilox yên heywanen herîkêm 12 mehî tê dayîn.
- Ji bo hilanîna goşt dank û qofeyên qanûnî û paqij bi kar bînin. Di havînan de goşt di qofeyên sar de hilînin.

Eger pirsên zêde hebin an jî agahdariyên din derbareyê telqîn û dersên taybet bêن xwestin, hûn dikarin serî li dayireya bajarî ya veterinerê bixin (li Şaredarî an jî li Walîtiyê).